Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 386 nameronahi@gmail.com 31 - Gulan - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Hilberîna genim û ceh li Cizîrê kêm bûye





Îsal di encama rewşa hewayî ya herêma Cizîrê de ziyanên mezin li hilberîna ceh û genim bûye. Desteya Çandiniyê jî tedbîrên ji bo alîkariya cotkaran wergirtin.

Herêma Cizîrê û Bakurê Sûriyê îsal zivistaneke zuha derbas kir û di destpêka Gulanê de baran bi dijwarî barî. Di encama lehiya ku li ser zeviyên çandiniyê rabû de andoreke neyînî li hilberîna çandiniyê kir.

Bi barîna barana buharê re, hişt ku simbilên ceh û genim bikevin xwarê û di palekirina wan de astengî derdikevin.

Di dawiya sala borî de bi armanca alîkariya bi cotkaran re Komîteya Çandiniyê ya girêdayî Desteya Aborî ya Cizîrê tova genim, cihe û semad bi deyn da cotkaran.

Endamê Rêveberiya Komîteya Çandiniyê Ehmed Silêman diyar kir ku hilberîna ceh ji sedî 70 û hilberîna genim jî ji sedî 55 ziyan dîtiye.


Silêman da zanîn ku wan serjimariyek di derbarê rêjeya ji sedî ya zeviyên çandiniyê ya hilberînên cûda di salên 2017 û 2018'an de pêk anîne.

Silêman anî ziman ku zeviyên li Cizîrê hatine çandin ji sedî 90 e û wiha got: "Ji sedî 50 bi ceh û genim hatine çandin, ji sedî 25 nîsk û baqil hatine çandin û ji sedî 15 jî pembo hatiye çandin."

Silêman destnîşan kir ku wan biryar girtiye alîkariya cotkarên ziyan dîtine bikin.

Di derbarê çalakiyên çinîna hilberîna genim û ceh de Ehmed Silêman diyar kir ku wan buhaya paleyê ji patozan re diyar kirine û hevkariya xwe bi Yekîtiya Cotkaran û xwediyên patozan re didomînin her wiha mazot ji hemû patozan re peyda kirine...*Nûrî UMER-ANHA*

## Torên ava parkên bajêr tên sererast kirin



Beşê Hawîrdorê yê girêdayî Buroya Xizmetguzariyan a Şaredariya Gel a bajarê Tebqayê toreya ava parkên bajêr sererast dike.

Di serdema dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê li Tebqayê de pompên derxistina avê yên avdana darên parkên bajêr hatin xirabkirin.

Piştî ku bajar ji aliyê Hêzên Sûriya Demokratîk di 10'ê gulana sala borî de hate rizgarkirin, xebatên sererastkirina hemû aliyên bajêr dest pê kirin.

Li gorî Beşê Hawîrdorê xebatên heta niha pêk hatine elektrîk ji pompê re hatiye peyda kirin û dê di demeke nêzî de pompe were sererastkirin.

Girêdayî mijarê hevserokê Beşê Hawîrdorê ya Şaredariya Gel a Tebqayê Cemal Ebdilletîf da zanîn ku ev pompe ava avdanê ji toreya avê ya herdu parkên Nexweşxaneya El-Wetenî û Navenda Çand û Hunerê û Depoya avê ya rojhilat re peyda dike.

Bi amadekirina vê pompê ava avdana darên herdu parkan dê were peyda kirin û herdu park dê ji nû ve bêne geşkirin...*ANHA*

# Minbic bajarê şaristaniyan e, dîroka wê qedîm e -1-





Bajarê Minbicê yê Bakurê Sûriyê dikeve bakur-rojhilatê bajarê Helebê û 80 km dûrî çemê Firatê ye. Bajarê Minbicê xwedî girîngiyeke dîrokî û strastejîk e û wekî paytexta Sûriyê ya herêma Firatê dihat nasîn.

Bajarê Minbicê girêdayî parêzgeha Helebê bû û li gorî gelhêjmariya sala 2004'an nufûsa wê 408 hezar bû.

### BINAVKIRINA MINBICÊ

Bajarê Minbicê xwedî gelek şarsitaniyan bû, ji ber vê yekê wek bajarê nivîskaran tê naskirin.

Di dîrokê de navên ku li bajarê Minbicê hatî kirin ev in, "Hierapolis (bajarê pîroz), Ebroqîş an Ebroqlîs (bajarê rahiban), bajarê Lita Aşûr, bajarê Edessa, bajarê paytextan, bajarê Menbeh û bajarê Seryas.

Di dema Hûsiyan de navê bajar Mabog lê kirin. Lê dema Asûriyan dest danîn ser bajar navê Nampige lê kirin. Aramiyan jî navê Nappigu lê kirin. Bi demê re navê bajar bû Mabug (Çem), Yewnaniyan navê Bambyce lê kirin. Romayiyan jî navê Hierapolis lê kirin.

### DÎROKA MINBICÊ

Li gorî lêkolînên ku li ser bajarê Minbicê hatin kirin, bajarê Minbicê girêdayî "Beyt Edînî" ya Ermeniyane ku dikeve navbera çemê Belîx û çemê Firatê. Paytexta wê jî bajarê Bersîb (niha navê bajar Til Ehmer e) a dikeve başûrê bajarê Cerablusê.

Dema ku Iskender ê Makedonî serweriya xwe li ser bajar ferz kir, bajar ji aliyê malbata Ebid Heded a Ermenî ve dihat birêvebirin. Wê demê Minbic bû bajarê îbadeta xwedayên Atar Gatis. Bi vê yekê girîngiya bajar zêde bû û di serdemên Helenî, Romayî û Bzansî de, veguherî xeta parastina li dijî Persan. Li derdora bajar sûreke parastinê hebû, lê piştre hat rûxandin û welatiyan kevirên wê ji bo lêkirina malan bi kar anîn.

Di dema Seyfûdelah El-Hemedanî de, li herêmê şer di navbera dewleta Hemedanî û Bîzansiyan de rû da. El-Hemedanî di sala 945 PZ de herêmeke berfireh ku ji Antakya û Minbicê pêk tê bi dest xist. Di vê demê de bajarê Minbicê ji aliyê çandiniyê de xwedî girîngiyeke mezin bû, ji ber ku nêzî bajarê Helebê û çemê Firatê bû. Lê heta sedsala 10'emîn şerê di navbera Bîzansî û Hemedaniyan dewam kir. Piştre bajarê Minbicê ket bin serweriya Zenkiyan û di sala 1176'an de ji aliyê Selaheddîn Eyûbî ve hat rizgarkirin. Piştre jî bajar ket bin serweriya Memalîkan.

Di sala 1401'î de bi fermandariya Teymûrlenk li Bakurê Sûriyê şerek derket. Di encamê de Teymûrlenk dest danî ser bajarên Heleb û Minbicê. Piştre Teymûrlenk leşkerên xwe tevî gelê Minbicê kuştin û bajar rûxand.

Di şerê Mercî Dabiq de serweriya Minbicê ket destê Osmaniyan. Di vê serdemê de tu girîngiya bajar nema. Guhertina ku di vê serdemê rû dabû ew bû ku di sala 1878'an welatiyên Çerkez koçî Minbicê kirin û bûn hemwelatiyên herêmê.

### BAJAR GELEK CARAN HATIYE RÛXANDIN

Di sala 53 BZ Kerasûsan bajar wêran kirin. Di sala 600 BZ de jî bajarê Minbicê ji aliyê Firewn El-Erec ve hat şewitandin. Sasaniyan jî sala 363 PZ bajar bi temamî rûxandin. Di sala 540 PZ jî Împarator Kisra bajar rûxand. Kostantîniyan jî bi sedan gelê herêmê kuştin û dîl girtin. Di sala 1240 PZ jî xawerizmiyan bajar tar û mar kirin û serweriya xwe li ser bajar ferz kirin.Di sala 1258 PZ de hukumdarê Moxol Holagu bajar rûxand. Di di sdala 1344 PZ de jî bajar ji ber erdheja bi pileya 6,5 bi temamî hat rûxandin û 57 hezar kesan jiyana xwe ji dest dan.Nivîskarê Sûrî Welîd Mişoh pirtûka "Şaristaniya geliyê Firatê" li ser Minbicê nivîsand û tê de behsa dîroka herêmê kir. Hiqûqnas Ebdulqadir Eyaş sala 117 lêkolînek li ser geliyê Firatê çêkir.Zanyarê erdnîgarî Ebû Huseyn Mihemed Bin Ehmed Cibêr sala 580 PZ pirtûkek li ser xwezaya bajarê Minbicê nivîsand...Ekrem Berektan-*ANHA*

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 386 31 - Gulan - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

**Kurd çarenûsa xwe dinivîsin**



*Tayip TEMEL* *R-4*

# GOTIN TÊRA HOVÎTIYA DEWLETA TIRK NAKIN



### ZILMA LEŞKER Û ÇETEYAN

Dewleta Tirk ya dagirker û çeteyên wê piştî ku Efrîn dagirkirin dest bi her awayî kirinên der mirovî û hovîtiyê kirin. Niha bi sedan welatiyên Efrînê li girtîgehên Efrîn, Raî, Ezaz û Hatayê dîl hatine girtin. Sivîlê Efrînî Xelîl Mihemed ku 67 rojan di destê artêşa Tirk de dîl girtî ma behsa hovîtiya wan kir.

### HER ROJ ÊŞKENCE

Dewleta Tirk û çeteyên wê piştî ku gundê Balya yê Bilbilê dagir dikin welatiyê bi navê Xelîl Mihemed ku li gundê xwe maye hêsîr digirin. Xelîl Mihemed got, ''Zilma li wir nayê gotin. Ew ne misilman in. Em birin girtîgeha Raî ya EzaZê. Bi sedan kes li Raîyê têne girtin û her roj êşkenceyê li wan dikin."

### HERT TIŞT DEWLETA TIRK E

Xelîl wiha got, "Zarokên 12-13 salî jî dîl girtine, her roj êşkence li wan jî kirin, elektrîk dane wan. Rojê tenê nanek didane 4 kesan, derfetên xweşuştinê nebû, çixare nedidan û her cure êşkenceya ku nayê hişê mirov dikirin. Li girtîgehê hemû biryar ji hêla dewleta Tirk û çeteyên wê ve têne dayin, ti mafê gotinê yê çeteyên bi navê Artêşa Azad tune ye." *R-5*

## 1'ê Hezîranê pêngaveke mezin bû



Endama Komîteya Rêveber a PKK'ê Hemrîn Dersim, li ser pêngava 1'ê Hezîranê ku piştî agirbesta 6 salan 2004'an dest pê kir axivî û diyar kir ku pêngava 1'ê Hezîranê li hember hewldanên tinekirinê bersîveke mezin bû. Hemrîn wiha got, "Şerê azadiyê şerekî mafdar e. Têkoşîna me wê heta azadiyê li her qadê dewam bike." *R-3*

## Ji bo HDP'ê têk bibin seferber bûne

Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî di çarçoveya xebatên hilbijartinê de li bajarê Tirkiyê Enqerê bi gel re civiya. Temellî bal kişand ku Desteya Bilind ya Hilbijartinê YSK jî di nav de hemû saziyên dewletê ji bo HDP'ê têk bibin ketine nava seferberiyekê. Temellî got, "Em ê di 24'ê Hezîranê de benda hilbijartinê hilweşînin." *R-5*

## Pirtûka Sakîne Cansiz hate nasandin

Îngilîziya pirtûka yek ji damezînerê PKK'ê ku di 9'ê Çile ya 2013'an de li Fransa Parîs ji aliyê MÎT ê Tirk de hat şehîd xistin Sakîne Cansiz a bi navê "Jiyana min timî şer bû" (Sara My Whole Life Was a Struggle), roja 29'ê Gulanê li paytexta Îngilîstan Londonê bi civînekê hate nasandin. *R-5*

## Destan Temûz têkoşereke bê hempa bû

Şervana Enternasyol ya MLKP' Ayşe Denîz Karacagîl (Destan Temûz) ku di Pêngava Rizgarkirina Reqayê de şehîd bûbû, di salvegera şehadeta xwe ya yekemîn de li Goristana Şehîd Dicle ya li Kobanê li ser gora xwe hate bîranîn. Bi sedan şêniyên herêmê û şervanên MLKP'ê di bîranînê de amade bûn. *R-2*



## Gelê Efrînê şandeya Rûs qewitand



Dewleta Rûs ya bê exlaq weke ku tîştek nebuye qaşo dixwaze alîkariya gelê Efrînê bike. Welatiyên Efrînê yên ku ji ber êrîşên dewleta Tirk ya dagirker yên bi piştgiriya Rûsyayê ku neçar man li herêma Şehbayê bi cih bibin, şandeyeke Rûs ya qaşo dixwest alîkariyê bide, qewitandin. *R-2*

## Emê aşitî û demokrasiyê bînin Tirkiyê



Xebatên hilbijartinê yên HDP'ê li Tirkiye û bakurê Kurdistanê bi hemû leza xwe didome. Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan,di çarçoveya xebatên hilbijartinê de li navçeya Nazîllî ya bajarê Tirkiyê Aydinê ji gel re axivî û diyar kir ku HDP hêviya welat e û wê aşitî û demokrasiyê bîne Tirkiyê. Pervînê got, "Ji bo vê divê HDP 24'ê Hezîranê bi awayekî xurt biçe parlementoyê. Em ê bi hev re bi ser bikevin." *R-3*

## Li 1021 navendan encamên hilbijartinê hatin betalkirin

Li tevahiya Iraqê di 12'ê Gulanê de hilbijartinên parlamentoya Iraqê hatin kirin. Lê tevî ku ev nêzî 20 roj li ser hilbijartinan re derbas bûn jî nîqaş û nerazîbûnên derbarê encamên hilbijartinan de dewam dikin. Komîsyona Bilind a Hilbijartina Serbixwe ya Iraqê li welat û derveyî welat encamên hilbijartinê yên 1021 navendan betal kir. *R-2*

## Nameyek ji Zanyar Muradî û Ramîn Hisên



Rêjîma Îdamê ya Îranê timî bi darvekirinê li dijî gelê Kurd weke gefekê bikartîne. Girtiyên siyasî yên kurd Ramîn Hisên û Zanyar Mûradî ku rêjîma Îranê cezayê îdamê li wan birriye ji bo raya giştî peyam şandin û banga hişyariyê kirin.*R-5*

## Demîrtaş: Divê em dengê xwe biparêzin

Namzetê HDP'ê yê serokkomariyê Selaheddîn Demîrtaş diyar kir ku rola HDP'ê di hilbijartinan de sereke û krîtîk e û bal kişand li ser girîngiya parastina dengan. Demîrtaş ji rojnameya The National ya ku li Îmarata Erebî weşanê dike re axivî û wiha got, "ez di girtîgehê de me. Ji ber vê jî kî were hilbijartin ew ê meşrûiyeta wî/ê qels be." *R-4*

## Divê malbatên girtiyan baş bixebitin

Komîteya Zindanan a PKK'ê li ser hilbijartinên 24'ê Hezîranê daxuyaniyek da destnîşan kir ku hilbijartinên 24'ê Hezîranê wê bibin hilweşîna fermî ya bloka faşîst a AKP-MHP'ê. Komîteyê wiha got, "Malbatên zêdeyî 10 hezar girtiyên siyasî, li dijî vê desthilatdariya faşîst a ku zarokên wan bi rengekî neheq xistiye zindanê, zext û êşkenceyê li wan dikin, divê li şûna zarokên xwe jî bixebitin." *R-4*

## Derwêş: Em ji Minbicê venakişin

Berdevkê Fermî yê Meclîsa Leşkerî ya Minbicê Şervan Derwîş vekişandina Meclîsa Leşkerî ya Minbicê ji bajarê Minbicê derewand û diyar kir ku gelek alî dixwazin ewlehî û aramiya herêmê tevlî hev bikin. Derwêş got, "hevkariya me ya bi hêzên koalîsyonê re dewam dike." *R-4*

## Ocalan: Wan xera kir emê ava bikin

Namzetê parlamenteriyê yê Partiya Demokratîk a Gelan HDP'ê yê Rihayê û Biraziyê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Omer Ocalan, diyar kir ku tenê rêya çareseriya pirsgirêkên Tirkiyê HDP ye. Ocalan got, "HDP wê di çareseriya pirsgirêkên siyasî û civakî de rolek mezin bide ser xwe. Ew perçe û xera dikin. HDP jî komî ser hev dike û ava dike." *R-4*

## Daran hildikin, bargehên leşkerî çêdikin

Artêşa Tirk ya dagirker û çeteyên wê hewl didin dagirkeriya xwe ya li Efrînê mayînde bikin. Dewleta dagirker dest daniye li ser mal û milkên welatiyan û wan talan dike. Hat ragihandin ku li ser erdê sê Efrîniyan 500 darên zeytûnê hatine rakirin û li cihê wan baregeha leşkerî tê avakirin. *R-5*

## HPG'ê lê da, 26 leşker hatin kuştin

Gêrîlayên Kurdistanê li bakur û başûrê Welat derbên giran li hêzên dagirker didin. Gêrîla li başûr û bakur li dijî artêşa Tirk a dagirker çalakiyên bi bandor lidarxistin. Navenda Ragihandin û Çapemeniya HPG'ê diyar kir ku li Lêlkan, Berwarî, Gever û Çelê di encama çalakiyên gerîla de 26 leşkerên Tirkyên dagirker hatine kuştin. *R-2*

# Gelê Efrînê şandeya Rûs qewitand

***Dewleta Rûs ya bê exlaq weke ku tîştek nebuye qaşo dixwaze alîkariya gelê Efrînê bike. Welatiyên Efrînê yên ku ji ber êrîşên dewleta Tirk ya dagirker yên bi piştgiriya Rûsyayê ku neçar man li herêma Şehbayê bi cih bibin, şandeyeke Rûs ya qaşo dixwest alîkariyê bide, qewitandin.***

Şêniyên Efrînê yên di kampa Berxwedan de dimînin, berdan şandeya Rûsî ku di bin navê alîkarîdayîna welatiyan hatin Kampê. Efrîniyan gotin: "Em Efrîn dixwaz im, em alîkariyên we naxwaz in."
Şêniyên Efrînê yên ji ber êrîşa dewleta Tirk û çeteyên wê neçar man malên xwe terk bikin û li kantona Berxwedan a Kantona Şehbayê bi cih bibin. Welatiyên Efrînê di kampên Berxwedan û Serdemê de bi cih bûne.
Efrîniyên di kampa Berxwedan de bi cih bûne berdan şandeyeke Rûsî ku di bin navê alîkariya dayînê hatin kampê û ji wan re gotin ku ew Efrîn dixwaz in ne alîkariyên wan.
Welatiyan diruşmeyên "Rûsiya li ser dagirkeriya Efrînê bi dewleta Tirk re lihev kiriye" berdan şandeya Rûsî.
Di meha derbasbûyî de jî şandeyek Rûsî derbasî kampê bûn, lê welatiyên Efrînê qebûl nekir şande derbasî kampê bibe û alîkariyên wan jî qebûl nekirin…
*ANHA*



## HPG'ê lê da, 26 leşker hatin kuştin

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir ku hêzên wan li Lêlkan, Berwarî, Gever û Çelê li dijî artêşa Tirk çalakî li dar xistine û di van çalakiyan de bi giştî 26 leşker hatine kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê têkildarî çalakiyên li Lêlkan, Berwarî, Gever û Çelê daxuyaniyeke nivîskî belav kir.
Di daxuyaniya HPG'ê de ev tişt hatin diyarkirin:



### LI LÊLKANÊ 19 LEŞKER HATIN KUŞTIN

"Di çarçoveya Pêngava Şoreşger a Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de hêzên me di 29'ê Gulanê de li dijî artêşa dagirker a Tirk hin çalakî li dar xistine.
Saet di 10.00'an de hêzên me li dijî artêşa dagirker a Komara Tirkiyeyê ya li Girê Lêlikan ê li herêma Sidekayê çalakiyek li dar xistiye. Hêzên me ji nêz ve ji 4 aliyan ve li çeperên dijmin dane. Li vê derê 6 çeper û stargeheke dijmin hatiye îmhakirin, bi qasî ku hatiye tespîtkirin 19 leşkerên dijmin hatine kuştin. Di vê çalakiyê de rêhevalê me Şahan Tolhildan şehîd bûye yê ku bi qehremanî çûye ser çeperên dijmin.

### LI GEVERÊ 4 LEŞKER HATIN KUŞTIN

Saet di 19.30'an de hêzên me li dijî leşkerên dijmin ên li Girê Evliya ya Gevera Colemêrgê çalakiyek li dar xistiye. Di vê çalakiyê de bi qasî ku hatiye tespîtkirin 4 leşkerên dijmin hatine kuştin.

### LI BERWARÎ 2 LEŞKER HATIN KUŞTIN

Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşger a Şehîd Delal Amed û Şehîdên Bestayê de di 29'ê Gulanê de saet di 15.00'an de li dijî qereqola Osyanê ya Berwariya Sêrtê hin çalakiyên sûîkastê li dar xistine. Di van çalakiyan de 2 leşker hatine kuştin.

## Elmanan got, "çekan nedin Tirkiyê"



Li gorî anketeke ku li Elmanyayê hate kirin, 83 ji sedî yê beşdaran xwestin, çek ji Tirkiyê re neyê dayin. Her wiha 80 ji sedî yê Elmanan gotin, "Divê çek ji herêmên ku şer lê hene neyê şandin."
Yek ji mijarên ku li Elmanyayê tê nîqaşkirin, firotina çekan e. Şîrketa bi navê YouGov bi rêya înternetê li ser mijarê anketek amade kir û encamên wê weşand. Piraniya beşdarên anketê mîna sendîka, partiyên mûxalefetê û tevgerê aştiyê gotin, "Divê ji herêmên bi pirsgirêk ên şer lê hene, çek neyên firotin."
80 ji sedî yê beşdarên anketê li dij in ku çek ji herêmên şer re bên şandin. Balkêş e ku 64 ji sedî yê Elmanan gotin, "Divê Elmanya bi ti awayî ji biçekbûna dewleteke din re nebe alîkar."
Di vê anketê de jî eşkere bû, yek ji mijarên sereke ku raya giştî ya Elman li dij derdikeve; firotinaçekan ji bo dewleta Tirk e.
83 ji sedî yê Elmanan xwestin, çek û alavên leşkerî bi ti awayî ji Tirkiyê ku endamê NATO'yê ye, neyên firotin.
Anket di navbera 16-18'ê Gulanê de hate kirin û 2026 kes tevlî bûn.

## Destan Temûz têkoşereke bê hempa bû



Şervana Enternasyol ya MLKP' Ayşe Denîz Karacagîl (Destan Temûz) ku di Pêngava Rizgarkirina Reqayê de şehîd bûbû, di salvegera şehadeta xwe ya yekemîn de hate bîranîn.
Merasîma bîranînê li Goristana Şehîd Dicle ya li kantona Kobanê ji aliyê Meclîsa Malbatên Şehîdan ve hate organîzekirin.
Bi sedan şêniyên herêmê û şervanên MLKP'ê di bîranînê de amade bûn.
Piştî deqeyeke rêzgirtinê, axafin bi navê YPJ'ê Bêrîtan Kobanê, Saziya Yekîtî û Piştgiriya Gelan Bêrîtan Asya û Fermandara MLKP'ê Şengul Doz ve hatin kirin.
Di axaftinan de têkoşîna Destan Temûz a li hemberî faşîzmê û piştgiriya gelên bindest hate vegotin, hate diyarkirin ku şehîd Destan di girtîgehên rêjîma Tirkiyê li hemberî zordariyê li ber xwe da, li çiyayê Kurdistanê jî têkoşînek meşand.
Herî dawî li bajarê Reqayê li dijî terora DAIŞ bi qehremanî şer kir û tevlî kerwanên şehîdên azadiyê bû.
Axaftivanan soza şopandina xeta şehîdan dûbare kirin. Hevalên şehîd Destan çîçek li ser gora wê danîn.

## Li 1021 navendan encamên hilbijartinê hatin betalkirin

Komîsyona Bilind a Hilbijartina Serbixwe ya Iraqê li welat û derveyî welat encamên hilbijartinê yên 1021 navendan betal kir.
Komisyona Bilind a Hilbijartina Serbixwe ya Iraqê encamaê dengên hezar û 21 (1021) navendên dengdanê betal kir
Komisyona Bilind a Hilbijartina Serbixwe ya Iraqê îro ragihand ku encama dengên hezar û 21 navendên dengdanê li Iraq û Herêma Kurdistanê hatine betal kirin.
Li gor vê encama 73 navendên dengdanên li Hewlêr, li Embar 50, li Bexda 6, li Selahaddîn 36, Nînava 179, li Diyana 2, li Dihok 224, Kerkûk 186 û Silêmaniyê 96 e.
Her wiha Komisyonê diyar kir ku encamên 67 navendên dengdanê yên li Elmanya, Urdin, DYA,



Swêd, Brîtanya û Tirkiyê jî îptal kirine.
Her wiha Komisyonê ragihand ku di çarçoveya lêkolîna li ser 2 hezar navendên dengdanê de, encama 852 navendên din betal kirine.
Li tevayî Iraqê di 12'ê Gulanê de hilbijartinên parlamentoya Iraqê hate kirin. Li herêma Kurdistanê gelek hîle û sextekarî hatibû kirin û li ser vê Tevgera Goran, Hevpeymaniya Demokrasî û Edaletê, Yekgirtû û Komela Îslamiya Kurdistan encamên hilbijartinê red kiribûn û îtiraz kiribûn.

## Li Koreya Bakur 120 hezar girtiyên siyasî hene

Li gorî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, rêveberiya Pyongyangê zêdeyî 100 hezar kes ji ber nêrîna xwe ya siyasî girtî ye.
Li gorî rêveberiya DYA; li girtîgehên Koreya Bakur ji 80 heta 120 hezarî, girtiyên siyasî hene.
Li gorî îdîaya ku xwe dispêre Rapora Azadiya Olî ya 2017'an a Wezareta Karên Derve ya DYA, gelek girtî ji ber baweriyên xwe yên olî hatine girtin.



Di raporê de hate îdîakirin ku rewşa li girtîgehên Koreya Bakur 'tirsnak' e û li ser şert û mercên girtîgehan agahiyeke zelal nîne.
Rêveberiya Pyongyangê herî dawî sê hefte berê sê welatiyên DYA berdabû. Kesekî ku par li Koreya Bakur hate berdan û vegeriya DYA, hate îdîakirin ku ji ber êşkenceya lê hatibû kirin jiyana xwe ji dest da.

## Ayla Akad Ata hat berdan

Parlamenterê HDP'ê yê Erdexanê Dr. Taşkin Aktaş û aktivîsta TJA Ayla Akat Ata ku ji heman dozê dihatin darizandin, hatin berdan.
Parlamenterê Partiya Demokratik a Gelan (HDP) û namzetê HDP'êyê Hilbijartina 24'ê Hezîranê Dr. Taşkin Aktaş û Aktîvista Ayla Akat Ata ku ji heman dozê tê darizandin hatin berdan. Danişîna doza Akat û Taşkin li 1'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Agiriyê hat dîtin. Akat û Aktaş ên bi îdîaya "propaganda rêxistinê kiriye" doz li wan hatibû vekirin.
Aktaş û Ata û 3 kesên din ji doza dihatin darizandin hatin berdan.





# Bilbilê Kurdistanê; Tehsîn Taha

***Hunermendê Kurd yê bi nav û deng û ku weke şalûl û bilbilê Kurdistanê dihat nasîn Tehsîn Taha di 28'ê Gulana 1995'an de li Hollandayê jiyana xwe ji dest da. Tevî ku 23 sal li ser mirina wî re derbasbuye lê hê jî stranên wî riya mûzîka kurdî ronî dike.***

Stranbêj hene û hunermend hene. Tehsîn Tahayê nemir bi stranên xwe dikeve katagoriya hunermendiyê. Taha her çend ev 23 sal e ku koça dawîn kiriye lê hîn jî wekî xeleka ku muzîka klasîk û modern digihîne hev rêya hunera kurdî ronî dike

Dema ku mirov behsa kesayetên di dîrokê de şopa xwe hiştine dike helbet divê ku mirov wan di nav herka dîrokê de û cerebeyên ku ew çanda têde jiyane bigire dest û binirxîne. Dema ku hunermendê nemir Tehsîn Taha çavên xwe li dinyayê vedike qir û qiyameta 2'yemîn Şerê Cîhanê demên xwe yên herî dijwar dijî. Helbet welatê hunermendê gewre Taha jî bi Lozana ku di sala 1923'yan de hatiye îmzekirin bûye çar parçe. Beşa ku Taha çavên xwe li dinyayê vedike êdî başûrê Kurdistanê ye ji aliyê rejîmên mêtingeh ên îngilizan ve tê birêvebirin.

Helbet beşa ku Taha çavên xwe lê vekiriye malovanî ji serhildanên modern ên kurdan re kiriye ku serhildanên Berzenciyan heta salên 1932'yan jî bandora xwe li ser herêmê dike lê bi alîkariya îngilîzan serhildan tên tepeserkirin. Lê di warê siyasî de li Başûr hewldanên serxwebûnê her tim berdewam kirine ku ev rewş wekî kodên jiyanî li ser gelê Başûr bandora xwe kiriye. Taha di nav vê keftûlefta cîhanê de di sala 1941'ê de li navçeya Amêdiyeya Duhokê ji dayik dibe. Di dergûşa ev bajarê kevnar û bi temenê xwe sê hezar salî de, gelek mîr û hakim, helbestvan û nivîskar, dîrokzan û zimanzan, dengxweş û hunermend, şervan û şoreşger bi ked û hewldana xwe, mîrateyek ji nifşên nû re hiştine ku xizmeta wan nayê jibîrkirin.

### DEMÊN ZAROKTÎ Û CIWANTIYÊ

Taha hêj nû nû bi zar û ziman dikeve sed mixabin ku cerebeyeke din a kurdan ango Komara Mahabadê ku di 1945'an de tê avakirin, di 1946'an de tê rûxandin. Kurd hem li bakur, hem li başûr, hem li rojhilat û hem jî li rojavayê welat dikevin bêdengiyeke mezin di wan salan de.

Lê helbet jiyan bi her awayî wekî çemekî boş diherike. Malbata Tehsîn Taha ji ber ku bavê wî karmendê dewletê ye li Duhok û navçeyên wê gelekî digerin. Taha di temenê xwe yên nûciwaniyê de ku ji bo xebatê diçe Hedbaya Mûsilê li wir dest bi xebatên xwe yên muzîkê jî dike. Di sala 1956 yan jî 1957'an de ji Mûsilê vedigere Amêdiyê û li vir ji aliyekî ve lîseyê dixwîne û li aliyê din jî dixebite.

Piştî ku perwerdeya xwe ya lîseyê diqedîne dikeve ezmûnên ji bo beşa kurdî ya Radyoya Bexdayê û bi ser dikeve. Dema ku li radyoyê dest bi kar dike strana wî ya pêşî ya ku dibêje 'Aşkera nakim' e. Di sala 1958'an de general Abdulkerîm Qasim li hemberî serokwezîrê dawîn ê monarşiya Iraqê Ahmet Muhtar Baban bi piştgiriya kurdan darbeyeke pêk tîne û dibe serokkomarê Iraqê. Qasim ê ku sozên ji bo otonomiya kurdan pêk nayne di navbera wî û kurdan de cih bi cih pevçûn rû didin.

### HUNERA PROFESYONEL

Di bin siya vê rewşê de di sala 1960'î de Tehsîn Taha jî li Zanîngeha Bexdayê di Beşa Hunerê de dest bi perwerdeyê dike. Ji salên 1960'î û pê de Tehsîn Teha bi awayekî berfireh dest bi karê xwe yê hunerî dike. Di destpêkê de bi karê şanogeriyê (lîstikvanî û nivîsandina senaryoyê) derdikeve pêşberî gel. Lê tenê bi karê şanoyê têhnbûna wî ya ji bo hunerê naşikê. Li ser vê yekê dîsa dengê xwe dike alaya hest û dilînên xwe û gelê xwe. Gihîştina bi vê xweziyê di wî çaxî de karekî wiha hêsan nîn e. Sedemên olî, paşverûtiyên civakî, taybetmendiyên dijwar ên serdema feodalîzmê, li ber wî astengên bi kelem in."Mitrib" peyvek çewt û nîşana sivikatiyê ye ku piraniya kurdan ji hunermendên mîna M. Arifê Cizîrî, Nesrîn Şêrwan, Hesen Cizîrî, Elî Merdan, Tahir Tofîq, Hesen Zîrek û yên din re jî digotin. Ji xeynî vî derdê giran ku huner û dengê gelek keç û xortên kurd di gewrî û singê wan de fetisandibû, bindestiya Kurdistanê serbarê hemû derdan bû.

Di nav vê rewşê de li aliyeke têkoşîna gel a ji bo azadiyê û li aliyê din jî helwesta gel a li hemberî hunermendiyê dike ku Taha hunera xwe zêdetir bixe xizmeta şoreşê. Di sala 1961'ê de pevçûn derdikevin aseteke bilindtir; gel êdî bi çalakiyên şermezarkirinê bi hezaran dadikevin kolanan û daw û doza mafên xwe yên hatine xespkirin dikin. Di wan çalakiyan de em Tahayê ciwan ê hunermend wekî çalakgerekî aktîf li pêş dibînin. Taha ji ber çalakiyekê tê binçavkirin û 15 rojan di binçavan de rastî îşkenceyên giran tê.

Hunermendê gewre li hemberî desthilatdariyê êdî gotinên xwe tûjtir dike lê belê lêgerîna xwe ya ji bo hunerê jî didomîne. Piştî ku Abdulkerîm Qasim li Iraqê dewra monarşiyê digire û pêve Taha jî wekî hemû kurdan difikire ku dê derî li jiyaneke hevpar vebe lê mixabin ev pêk nayê. Ji ber vê yekê jî Taha bi stranên xwe yên nûjen dixwaze ku ciwanên kurd bi bandor bike da ku li hemberî rejîma Qasim bikevin nava hewldanê.

### HEVNASÎNÊN LI RADYOYÊ

Taha li aliyekî zanîngeha xwe dixwîne li aliyê din huner û çalakiyên siyasî jî ji bo wî bûne wekî nasnemeyên wî. Ji ber van sedeman di sala 1963'yan li Bexdayê tê girtin û wî dixin girtîgehê. Strana ku li zindanê çêkiriye ya yekem jî ya bi navê 'Têtin bihar' e. Taha piştî ku salekê di girtîgehê de dimîne tê berdan û xwendina xwe didomîne. Piştî mezûniyetê li Mexmûrê dibe mamosteyê muzîkê. Piştre heta sala 1970'yî li Hewlêrê mamostetiyê dike.





Piştî ku têkiliya dewleta Iraqê û kurdan normalîze dibe gelek caran diçe Bexdayê. Li Radyoya Bexdayê bi hunermendê nemir Bavê Felekê ango Mihemed Şêxo re têkiliyê datîne. Li Radyoyê stranên bi navê'Aso' û 'Ey hewar' bi hev re dibêjin. Taha di serdanên xwe yên radyoyê de bi muzîkjenên mezin ên kurd Mihemed Arîf Cizrawî, Hesen Cizwarî, Elî Merdan, Meryem Xan, Îsa Berwarî têkiliyan datîne. Ligel vê bi hunermendên wekî Gulbihar û Eyşe Şanê re duetan dike û li bajarên wekî Hewlêr, Duhok û Bexdayê bi wan re konseran dide.

### STRANÊN NÛJEN

Tehsîn Taha bi helbesta nû ku bi navê 'helbesta îro' jî tê zanîn, dest bi gotina 'Strana kurdî ya nû' dike. Helbet ji bo dema xwe ev helwesteke donkîşotwarî ye jî lê belê ev pêngav di nav ciwanan de rastî eleqeyeke baş tê. Gelek kesan xwestin di destpêka vî karê nû de ev helwesta 'şikandina tabûyan'a Tehsîn Taha mîna guneh an jî sûceke mezin di nav gel de bidin nasandin, lê heza piraniya ciwanên kurd ên ji hemû deverên başûrê Kurdistanê, zû dijberên hunera Taha ya nûjen bêdeng dikin. Pîvana gel ji bo wî pîroziyeke mezin e.

Tehsîn Taha di herêma Behdînan de yekemîn kes bû ku bi awayekî nûjen strana kurdî ya nû bi awazên nû da destpêkirin. Ev jî karekî girîng bû. Ji ber ku her tim kesê ku karekî nû dike, ew kar li ser navê wî tê binavkirin. Nemir Şemal Sayîb li herêma Soran û Tehsîn Teha li herêma Behdînan ên başûrê Kurdistanê wekî serkêşên vê destpêka dîrokî tên naskirin.

### STRANÊN TEHSÎN TAHA

Taha di stranên xwe de ku bes wê demê di nav ciwanan de li ser zar û ziman bû dixwest ku gel bi peyamên di nav stranên wî de bikevin nav liv û tevgerê. Bi stranan hêza ciwanên kurd bixe nav tevgerê û li hemberî êrîşên bi her awayî ya Baasên faşîst li ber xwe bidin. Taha bi van armancan di konserên xwe yên li bajarên başûrê Kurdistanê ên wekî Duhok, Hewlêr, Amêdî, Silêmanî û paytexta Iraqê Bexdayê bi dengekî bilind diqîriya:

"...Ev warê he warê me ye, warê me ye, ma tu yê çawa ji me bistînî, bistînî..."

Di esasê xwe de di vê stranê de Taha li hemberî polîtîkayên erebkirinê yên faşîstên Baasî ku dixwestin li Kerkûk, Xaneqîn, Mûsil, Mendelî û gelek herêmên din ên başûrê Kurdistanê pêş bixin, hem bal dikişand ser ev polîtîkayan hem jî dixwest gel li hemberî vê hişyar be.

Di hemû stranên xwe yên wê demê de peyamên xwe bi awayekî veşarî di nav stranên xwe de dide. Taha di stranên xwe yên bi navê:"Bihêre Distar, Milletê me nemir e, Xewn, Newroz e, Ay Felek, Xalxalokê, Behdînan, Mala me li serê mihelê" û bi dehan stranên din de peyamên Kurdperweriyê û hezkirina welatê xwe vedibêje. Rewşa siyasî ya demê li ser stranên wî bandorê dikin û di stranên xwe de rewşê bi awayekî hunerî û nûjen vedibêje. Wekî mînak di strana xwe ya bi navê 'Ey Felek' de ku serhildana di pêşengiya Mela Mustafa Barzanî de di 1975'an de têk çû wiha dibêje:

"Ey felek bo te dinalim; Bo çi nêrgiz çilmisî; Ew çima bextê me hoye; Em bêdost û bêkes in…"

### TÊKOŞÎNA LI BAKUR

Taha di hemû jiyana xwe de ji bo azadiya kurd û Kurdistanê bi awayekî çalak tevgeriyaye û ev di stranên wî de jî diyar dibin. Taha tu carî rewşa parçekirina Kurdistanê qebûl nekiriye û têkoşîna li parçeyên din ên Kurdistanê jî tim li ser bala wî bûye. Têkoşîna Azadiya Gelê Kurd a li bakurê Kurdistanê jî gelek bandorê li ser wî dike û piştgiriya xwe ya bi tevgera Azadiyê re tim tîne ziman. Newrozên ku di salên 1990'î de li bakurê Kurdistanê ku bi serhildanan dihatin pîrozkirin wî gelekî bi kelecan dike û kêfa wî tîne.

Hunermendê mezin piştî ku kurd li başûrê Kurdistanê di sala 1991'ê de parî be jî digihîjin mafên xwe ji bo ku tedawî bibe berê xwe dide Ewropayê. Li Ewropayê jî kurdên ku bi awayekî rêxistinî li gel Tevgera Azadiyê ji bo azadiya Kurdistanê têdikoşin moreleke mezin didinê. Tehsîn Taha di 13'ê adara 1994'an de bi hunermend Fûad Ehmed re derdikeve ser dikê û tev li pîrozbahiya Newroza Holandayê dibe. Ev yek ji aliyê rêveberiya Başûr ve rastî nerazîbûnê tê. Taha ji ber vê yekê êdî venegare welatê xwe û li Holandayê bi cih û war dibe. Di ser vê yekê re zêde dem lê nakeve tenduristiya Taha xirab dibe û bi penceşêrê dikeve. Di vir de wekî spekulasyon be jî hesreta welat û helwesta rayedarên başûrî gelek bandor li ser vê nexweşiyê dikin. Hunermendê gewre di 54 saliya xwe de, 28'ê gulana 1995'an li Holandayê jiyana xwe ji dest dide.

### NASNAMEYA HUNERA TAHA

Nivîskar-lêkolîner Ahmed Balayî beriya çend salan di bîranîneke ev hunermendê gewre de têkildarî kesayeta wî wiha dibêje;"Zehmet e mirov bi gotinan Tehsîn Taha bîne ziman, ew şalûl û bilbilê devera Behdînan û yê Kurdistanê bû. Mirov çiqas jî biaxive têrê nake, lê ya rastîn dilovanî, mirovayetî û kurdperwerî nasnameya hunera wî bû. Xwediyê hesteke nazik, wijdanekî tenik û navekî pîroz bû. Aşiqê aştî, azadî û yeksaniyê bû."

### BERHEM Û ALBÛMÊN WÎ

Hunermendê nemir ê kurd piştî ku diçe ser dilovaniya xwe li dû xwe 8 albuman wekî mîrate ji gelê xwe re dihêle. Di van albumên wî de nêzî 100 stranên nûjen, folklorîk, epîk hwd hene. Albumên wî yên bi navê 'Aso' û 'Rabe Cotyar' piştî wefata wî ji aliyê Kom Muzîkê ve ji nû ve hatine amadekirin û li bakurê Kurdistanê jî gihîştiye ber destê muzîkhezan. Gelek berhemên Taha ji aliyê hunermendên kurd ve ji nû ve hatine şîrovekirin. Lê ew jî nisîbê xwe ji polîtîkayên 'Tirk-kirinê' wergirt. Lewre Îbrahîm Tatlises strana ku navê xwe pê da bihîstin 'Ayagimda Kundura' di esasê xwe de strana Tehsîn Tahayê nemir a bi navê 'Min xem deryayeke kûr e' ku adapteyê tirkî hatiye kirin.

### WESIYETA WÎ

Çîroka jiyana"hostayê strana kurdî ya nûjen" xemgîn e û dema mirov li gotinên wî yên dawiyê guhdarî dike, nikare hêsirên çavên xwe bigire. Tehsîn Taha di kasêtekê de ku ji xanima xwe (Hebîbe) û her çar kurên xwe (Vehêl, Gelvan, Warvan û Dîrhat) re ji Holandayê şandibû Amêdiyê, wiha dibêje:"Daxwaza min a herî pêşîn serxwebûna Kurdistanê ye. Pêwîst e kurd qet li doza welatê xwe xiyanetê nekin. Ger ez rojekê mirim min li axa Kurdistanê veşêrin. Lê beriya veşartina min, li goristana Amediyê ava 'Kaniya Mala' li laşê min bireşînin û piştre min di nava dilê axa Kurdistanê de veşêrin."… ***Ramazan OLÇEN - AMED***

# Li Reqayê pêngava komînan

***Komîn yek ji hîmê sereke yê avakirin û rêxistinkirina civakê ye. Li bakurê Sûriyê di xebatên rêxistinkirin û piştgiriya civakê de komîn xwedî roleke sereke ye. Di vê çarçoveyê de avakirina komînan dewam dike. Li Reqayê jî piştî ku hat rizgarkirin niha avakirina komînan didome.***

Pêngava avakirina komînan li bajarê Reqayê dewam dike. Li Taxa El Nehda 14 komîn hatin ava kirin. Piştî ku bajarê Reqayê ji aliyê şervanên Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê de ji bin dagirkeriya DAIŞ'ê hat rizgar kirin jiyan her roj lê asayî dibe û xebatên ji nûve rêxistinkirinê û ava kirina sîstemê bê navber didome.


Di çaçroveya hemleya avakirina komînan a ku ji aliyê Meclîsa Sivîl a Reqayê ve hate destpêkirin de, li taxa El-Nehda 14 komîn hatin avakirin.
Ji bo avakirina komînan herî dawî li taxê civînek ji aliyê meclîsê ve hate lidarxistin. Hevserokê Meclîsa taxê Hesen Xelîl û bi dehan şênî beşdarî civînê bûn.



Di civînê de Hevserokê Meclîsa taxa El-Nehda Hesen Xelîl diyar kir ku komîn yek ji stûnên avakirina civaka demokratîk e û gelê Bakurê Sûriyê wê bi îradeya xwe û di riya komînan re hemû pirsgirêkên xwe çareser bike.

Xelîl kar û xebatên komîn û komîteyên wê diyar kir û got ku pêwîste hevserokên komînê û endamên komîteyên wê erka xwe pêk bînin û li gorî berpirsiyariyê bin.

## Toreya avê sererast dike



Beşê Hawîrdorê yê girêdayî Buroya Xizmetguzariyan a Şaredariya Gel a bajarê Tebqayê toreya ava baxçeyên bajêr sererast dike.
Di serdema dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê li Tebqayê de pompên derxistina avê yên avdana darên bajêr hatin rûxandin.
Piştî ku Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê di 10'ê gulana sala borî de hate rizgarkirin, xebatên sererastkirina hemû devarên bajêr dest pê kirin.
Pompa sereke ya avdana baxçeyan li aliyê bakur-rojavayê bajêr dikeve û avê bi qasî 16 inç derdixîne.
Li gorî Beşê Hawîrdorê xebatên heta niha pêk hatine ceyran ji pompê re hatiye peyda kirin û dê di demeke nêz de pompe were sererastkirin.
Girêdayî mijarê Hevserokê Beşê Hawîrdorê ya Şaredariya Gel a Tebqayê Cemal Ebdilletîf got ku ev pompe ava avdanê ji toreya avê ya herdu baxçeyên Nexweşxaneya El-Wetenî û Navenda Çand û Hunerê û Depoya avê ya rojhilat re peyda dike.
Bi amadekirina vê pompê ava avdana darên herdu baxçeyan dê were peyda kirin û ji nû ve bêne vejandin.
Tê payîn ku xebatên sererastkirina pompa avê di van du hefteyan de bi dawî bibin. *ANHA*

## Em ê serbilind vegerin

**Idrîs HENAN**

Parêzerê Efrînî Îsrafîl Bakîr Mustefa ku niha li Şehbayê dimîne diyar kir ku dewleta tirk û çeteyên wê bacê li ser welatiyên Efrînê yên ku dixwazin biçin nava zeviyên xwe ferz dikin. Mustefa hişyarî da û got " divê gelê me xwe mecbûrî vegera di bin banê dagirkeriyê de nebîne, gelê me serbilind e û divê bi serbilindî vegere.
Parêzer Îsrafîl Bakîr Mustefa yê ji gundê Merwaniya jêrin e got ku; ew ji rojên destpêkê ve hovîtiya dagirkeriya Tirk li ser Efrînê belge dike. Mustefa tekez kir ku niha faşîzma Tirk û çeteyên wê nahêlin gelê me biçe nav zeviyên xwe û bacê lê ferz dikin.

**10 HEZAR DOLAR DISTÎNİN**

Mustefa mînaka mala Hec Muzefer ê ji gundê Merwaniya jorîn dide: Ji bo ku zeviyên xwe cot bikin û genimê xwe biçînin, ji her birayekî 10 Hezar dolar dixwazin. Ev ji bilî dizî, talan, bênamûsî û destdirêjiyê ye. Mustefa ji rojên destpêkê yên şer ve binbêkirinên dewleta tirk belge dike, Mustefa dazanîn ku tiştên hatine belgekirin li gorî kiryarên tên kirin gelek kêm e, rojane mirov tên kuştin, revandin û îşkencekirin.

**GELÊ ME LAYÎQÎ JÎYANEK AZAD E**



Derbarê Roja Cîhanî ya li dijî dagirkeriya Tirk ji Kurdistan û Efrînê re Mustefa got: Gelê Kurd keda xwe ji ber tevahî mirovahiyê daye, careke din isbat dike ku layîqî jiyaneke azad e. Wê ti carî milk û malê xwe di bin destê dagirkeriyê de nehêle. Yên ku împeratoriya DAIŞ şikandine Kurd bûn. Tekez wê mirovahî xwedî li vê gelê qehreman derkeve û li hemberî dagirkeriyê bi tenê nehêle.

**EM Ê SERBİLİND VEGİRİN**

Parêzer Îsrafîl Bakîr Mustefa di dawiya axaftina xwe de bang li kesên ku xwe mecbûrî vegerê dibînin kir û got: Bila gelê me vê şaştiya dîrokî neke. Gelê fêrî jiyana serbilind bûye, bila stûyê xwe nexe bin kêra celadan.

## Welatî ji ber bihabûnê bi gazinc in



Li navçeya Dirbêsiyê ya kantona Hesekê pirsgirêka bilinbûna nirxên madeyan hene, şênî nerazîbûnên xwe tînin ziman û komîteya Zimhêrê hewl û sozan dide di demeke nêzîk de çareser bike.
Şêniyên navçeya Dirbêsiyê ya kantona Hesekê ji ber bilindbûna buhayên madeyên xwarinê bi gazinc in û daxwaza çareserkirinê ji aliyên peywendîdar dikin.
Buhayê zebze û mêwe ji her kîloyekî re 100 lîre zêde bûye, buhaya kîloya goştê berxan 2400 lîre û goştê mirîşkan 800 lîre derbaskiriye.Seîd Meimo got: "Em ji Komîteya Zimhêrê daxwaz dikin ku firoşkaran bişopîne û buhaya sebza û mêweyan belî bike, ji ber ku em di rewşek aborî zehmet de dijîn."

Mensûr El-Ehmed da zanîn ku firoşkar ji bo zêde qezenc bikin bi buhaya madeyan dilîzin û wiha berdewam kir:" Her çiqas Komîteya Zimhêrê buhaya sebze û mêweyan destnîşan kiribe jî lê; firoşkar wan nirxan bi kar nayînin."
Di derbarê vê mijarê de Rêveberê Beşa Zimhêra Şaredariya Gel a Navçeya Dirbêsiyê Hemîd Osman got: "em bang li welatiyan dikin ku gilî û gazinên xwe li ser firoşkarên ku madeyan bi buhayeke mezin difroşin agahiyan bidin şaredariyê".
Osman destnîşan kir ku wê komîte di demeke herî nêz de dê çareseriyek ji bo vê pirsgirêkê bibîne…*ANHA*

## Zarokên Xorasanê bi nexweşiya çerm ketine



Ji sedî 80 zarokên gundê Eyaleta Xorasana Başûr a Îranê bi nexweşiya çermê laş ketine.
Parlamenterê navenda rêveberiya eyaletê Bircendê Mihemmed Bager Ebadî Li gorî ajansa nûçeyan a Îlnayê got, ''Van sê mehên dawî min ew ji nêz ve dîtin''.
Ji ber kêmbûna avê şêniyên herêmê baş nikarin paqijiya xwe bikin. Li 480 gundên Xorasana Başûr av kêm e û av bi qemyonan tê dayin. Gelek robar ziwa bûn.
Kêmbûna avê û ziwabûn hema hema li tevahiya Îranê problemeke giran e.
Tê gotin, ji ber sedema ku rêveberina avê baş nayê kirin ev bobelata ekolojîk rû dide. Bêyî ku li şertên derdorê binerin, ji bo ku hin kes dewlemend bibin gelek bendav hatin çêkirin. Çem û robar ziwa bûn û hikûmetê ti tevdîrek nestand.
Ji bo projeyên leşkerî û sanayiya çandniyê av bi sexberiyê hate bikaranîn. Ne tenê çem û robar, çirav jî ziwa bûn. Wezîrê Enerjiyê beriya bi demeke kurt got krîza avê bandora xwe li ser 334 bajar û 35 milyon kesî heye…*ANF*

## Deriyê Bendava Firatê tê sererastkirin



Kar û xebatên şaredariya Gel a Tebqayê da ku ji nûve bajar geş û xweş bikin berdewam dikin.
Piştî ku bajarê Tepqayê ji destên çeteyên DAIŞ'ê hat rizgar kirin xebatên ji nûve avakirin û pêşxistina bajarê berdewam dikin.
Di vê çarçoveyê de beşê Ekolojî yê girêdayî buroya Xizmetguzariyê dest bi sererastkirina deriyê başûr ê bendava Firatê kir.
Piştî ku tîmên taybet ên rakirina mayînan hemû bajar ji bermahiyên şer paqijkirin, Şaredariya Gel a Reqayê ji aliyê xwe ve dest bi kar û xebatên xweşikirina deriyê başûr yê Bendava Firatê kir.
Kar û xebatên sererastkirinê wê nêzî du heman dewam bike. Paşê wê beşê Ekolojî bi hevkariya beşê Baxan ên Rêveberiya Giştî ya Bendava Firatê dest bi çandina daran bikin…*ANHA*

## Şaredariya Hesekê bersivê nade



Îsal di rojên dawî yên buharê de baran gelekî bariya. Ji ber Herikîna lehiyan riya di navbera gundê Dawûdiyê û pakrewangeha Şehîd Dijwar a Hesekê xirabû. Di encamê de çûn û hatin asteng bûye. Şaredariya Hesekê jî heya niha bersiva çima rê sererast nebûye ne daye.
Pakrewngeh li nêzî gundê Dawûdiyê yê bajarê Hesekê hatiye avakirin, ji ber vê yekê bi hezaran welatî û malbatên şehîdan serdanê dikin. Di van demên dawî de, ji ber barîna baranê û herikîna lehiyan riya di navbera gundê û pakrewangehê de hate birrîn.
Niha welatiyên herêmê ji bo serdanan astengiyan dikişînin. Tevî ku gelek daxwazname ji Şaredariya Gel a bajarê Hesekê re hatin pêşkêşkirin, lê dîsa jî ev du meh in ti bersiv ji van daxwaznameyên sererastkirina rê re nehatine.



Welatiyê bi navê Ebdilmecîd El-Elî diyar kir ku şaredariyê sererastkirina rê paşguh kiriye û got ku eger rê wisa bimîne gelek qezayên trafîkê dê li ser rê rû bidin.
El-Elî bang li aliyên têkildar kir ku bi baldarî mijarê bigirin dest û pirsgirêkê di demeke lezgîn de çareser bikin.
Rayedarên şaredariya gel a Hesekê jî hîn tu bersiv an daxuyanî di derbarê zelalkirina mijarê de ne daye...*ANHA*



# 1'ê Hezîranê pêngaveke mezin bû

***Endama Komîteya Rêveber a PKK'ê Hemrîn Dersim, li ser pêngava 1'ê Hezîranê ku piştî agirbesta 6 salan 2004'an dest pê kir axivî û diyar kir ku pêngava 1'ê Hezîranê li hember hewldanên tinekirinê bersîveke mezin bû. Hemrîn wiha got, "Şerê azadiyê şerekî mafdar e. Têkoşîna me wê heta azadiyê li her qadê dewam bike."***



Endama Komîteya Rêveber a PKK'ê Hemrîn Dersim destnîşan kir ku pêngava 1'ê Hezîrana 2004'an tevî ku gaveke leşkerî bû, ji aliyê civakî û siyasî ve jî bersiveke mezin daye dewleta Tirk.

Endama Komîteya Rêveber a PKK'ê Hemrîn Dersim, li ser pêngava 1'ê Hezîranê ku piştî agirbesta 6 salan 2004'an dest pê kir axivî.
Li ser pêngava 1'ê Hezîranê ku weke 15'ê Tebaxê ya duyemîn jî tê pênasekirin, Dersim got, "Li dijî êrîşên hundir û derve; li dijî sekn û ferasetên ku dixwest bi destê xiyaneta navxweyî rêxistina me tasfiye bike, tevgera me bi sekna hevrêyên me yên şehîd bûn bersiveke mezin da."
Hemrîn Dersim diyar kir ku li dijî hewldanên tasfiyeyê, gerîlayên Kurdistanê ji nû ve berê xwe dan Bakurê Kurdistanê û dest bi pêngava 1'ê Hezîranê kirin.

**NE TENÊ PÊNGAVEKE LEŞKERÎ BÛ**

Dersim destnîşan kir ku pêngava 1'ê Hezîranê ne tenê pêngaveke leşkerî bû, divê ji her alî ve weke pêngaveke siyasî û civakî bê dîtin û wiha dewam kir: "15'ê Tebaxê bi pêşengiya Egîd (Mahsûm Korkmaz) hate kirin. Di 1'ê Hezîranê de jî Delal Amed wê wextê berê xwe da Dersimê û pêşengî ji pêngavê re kir. Her wiha fermandar Şevger, fermandar Mahîr û bi sedan lehengan bi sekna xwe ya fedayî bersiv dan. Bi vê bersivê re nîşanî dijmin dan ku em naşikên, em têk naçin û ti carî ji armanca xwe ya azadiyê venagerin. Ev ruh heta niha dewam dike. Têkoşîna me wê heta azadiyê li her qadê dewam bike."

**DIVÊ SERÎ LI BER FAŞÎZMÊ NEYÊ TEWANDIN**

Endama Komîteya Rêveber a PKK'ê Hemrîn Dersim diyar kir ku pêngavên dîrokî ti astengiyan nas nakin û got, "Dijmin dixwaze gelê Kurd tine bike, tasfiye bike. Ne çare ye ku mirov serê xwe li ber vê siyaseta tinekirinê ya faşîzmê bitewîne. Mîna ku 15'ê Tebaxê û 1'ê Hezîranê bersiv hate dayin, îro jî bi vî ruhî divê gel bê dudilî bersivê bide. Şerê azadiyê şerekî mafdar e. Li ku derê dibe bila bibe, li kîjan bajar, gund û welatî dibe bilav bibe, divê şer û têkoşîna azadiyê bê dayin. Coş û kelecana me, moral û baweriya me ya bi serketinê û ruhê me ti carî qels nebû."…*ANF*

## Emê aşitî û demokrasiyê bînin Tirkiyê

Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan,di çarçoveya xebatên hilbijartinê de li navçeya Nazîllî ya bajarê Tirkiyê Aydinê bû.
Bûldan li vir axivî û got: "Em hêviya vî welatî ne, em baweriya gel in. Em ê aştî û demokrasiyê bînin vî welatî."
Xebatên HDP'ê yên di çarçoveya hilbijartina 24'ê Hezîranê de didomin. Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan li navçeya Nazîllî ya Aydinê a bajarê Tirkiyê axivî.
Bûldan di axaftinên xwe de bal kişand ser van mijaran:
"Ev sê roj in em li Egeyê ne. Li Îzmîr, Manîsa û Aydinê ji derveyî HDP'ê ti partî li qadan nîne. Yekane partiya ku dixwaze Erdogan biçe HDP ye. Ji ber ku AKP'ê li vî welatî ji derveyî zilmê ti tişt nedaye Kurdan, Elewî, jin, ciwan û beşên din.
7'ê Hezîranê HDP bû hêviya vî welatî. Serkeftina me ya 7'ê Hezîranê hezim nekirin. Ji bo vê 1'ê Mijdarê çûn hilbijartinê. Di navbera 7'ê Hezîranê heta 1'ê Mijdarê de zilma herî mezin li Kurdan kirin. Sûr, Cizîr, Gever û Silopyayê hilweşandin. Li van bajaran welatiyên me bi saxî şewitandin. Li cihê hevşaredarên me yên ku bi vîna gel hatin hilbijartin qeyûm wezîfedarkirin. Parlementerên me hatin girtin. Ji ber ku me di siyaseta demokratîk de israr kir.
Her ku wan xwest me tine bikin em ji nû ve şîn bûn. Em li qadan in, kolanan in, di nava siyasetê de ne. Em li vir soz didin em ê 24'ê Hezîranê di serî de Selaheddîn Demîrtaş û hemû hevalên xwe yên din ji zindanê azad bikin. 24'ê Hezîranê fersedekî dîrokî ye. Em vê fersendê ji dest bidin, êdî fersendekî wisa bi destê me nakeve. Em li dijî yek kesî piranî, li dijî faşîzmê demokrasî , li dijî esaretê azadiyê diparêzin.
Em hêviya wî welatî ne. Baweriya gel in, em ê aştî û demokrasiyê bînin vî welatî. Ji bo vê divê HDP 24'ê Hezîranê bi awayekî xurt biçe parlementoyê. Em ê aştî, edalet û yekîtiyê bînin vî welatî. Em ê bi hev re bi ser bikevin,"



## Divê jin rola xwe hê zêdetir bikin



Forma Danûstandinan û Werşeya Kar di roja xwe ya duyemîn de bi nîqaşên derbarê pirsgirêkên jinan de bi dawî bû. Dozên jinan wê radestî NY'ê werin kirin.
Di 29'ê Gulanê de li bajarê Qamişlo yê herêma Cizîrê li ser banga Desteya NY ya Jinan û bi sponsoriya Meclîsa Jinên Sûriyê û bi alîkariya Kongreya Star di bin navê "Karên pêş ên jinên Sûriyeyê li bakur û bakur-rojhilatê Sûriyê" bi dawî bû.
Di formê de bi berfirehî derbarê pirsgirêkên jinan de nîqaş hatin meşandin û pêşniyar hatin kirin.
Hate gotin ku pêwîste rola jin di qada siyasî de were aktîfkirin û projeyên aborî yên jinna werin zêdekirin.
Di formê de hat pêşniyar kirin ku zagonên parastina jin yên derbarê tundiyê de werin danîn, derfetên kar di nava saziyan de ji bo jinan werin vekirin.
Derbarê pirsgirêkên jinan de bi raporekê wê radestî Destya Jin a NY'yê were kirin, Deste jî wê pirsgirêkan lêkolîn bike û li gor wê projeyan pêş bixe.

## Jin bi jineolojiyê xwe nas dikin



Kampa Jîneolojiyê ya Jinên Ciwan bi coşeke mezin bi dawî bû. Jinên Ciwan ên ku beşdarî Kampa Jîneolojiyê bûn diyar kirin ku Jîneolojî pênaseya xwenasîn û pêşketina kesayetên jixwebawer in.
Kampa Jîneolojiyê ya Jinên Ciwan ku di 21'ê Gulanê de li Gundê Jinwarê yê girêdayî Dirbesiyê, bi tevlîbûna 40 jinên ciwan dest pê kiribû, bi dawî bû. Di Kampa Jîneolojiyê ya Jinên Ciwan de li ser gelek mijarên derbarê jin de ders hatin dîtin. Jinên ku beşdarî Kampa Jîneolojiyê ya Jinên Ciwan bûn anîn ziman ku bi perwerdeya Kampa Jîneolojiyê di derbarê gelek mijaran de ew bûne xwedî agahî.
Endama Komiteya Jîneolojiyê ya Gundê Jînwarê Rûmet Heval wiha got: "Perwerdeya Kampa Jîneolojiyê ya Jinên Ciwan hefteyekê dewam kir. Perwerde bêtir bi nîqaşan derbas bû. Li ser gelek mijarên gîrêdayî jinan ders hatin dîtin. Perwerde têr û tije derbas bû."

**ARMANC XWE NAS KIRINE**

Endama Komîteya Amadekar a Perwerdeya Jîneolojiyê Tîjda Devrîm wiha got: "Ez wekî Şoreşgera Enternasyonal ji Fransayê tevlî Şoreşa Rojava bûm. Bi naskirina Şoreşa Rojava gelek tişt di kesayeta min de guherîn. Armanca Perwerdeya Jîneolojiyê ew bû ku Jinên Ciwan Jîneolojiyê û xwe nas bikin. Di heman demê de ji bo jinên ciwan bibin xwedî vîneke xurt ev perwerdeya Jîneolojiyê pêwist e. Bi naskirina Jîneolojiyê mirov dibe xwedî vîneke azad."…*JINNEWS*

## Hatina şandeyan encama pêngavê ye



Endama Rêvebir a Kongra Star li Kantona Qamişlo Henîfa Mihemed diyarkir ku hemleya wan a "jin ji bo Efrînê li ser piyan e" berdewam e. Henîfa destnîşankir ku hatina şandeyên jin yên biyanî û piştgiriya wan yek ji encamên hemleyê ne.
Henîfe derbarê encamên hemleyê de ev agahî dan: "hemleya me berdewam e. Ji bo piştgiriya jinên Efrînê ji semîner û civînan zêdetir, şandeyên jinên biyanî serdanî Rojava û Bakurê Sûriyê dikin. Bi armanca piştgirtiya hemleyê şande ji welatên cuda yên cîhanê, wekî Fransa, Birîtanî, Almanya û Arjentîn hatin Bakurê Sûriyê tên, şande rewşa jin ji nêz ve şopandin. Şandeyin jî serdana Şehbayê kirin û rewşa jinên Efrînê jî ji nêz ve şopandin.
Henîfe diyarkir ku şandeyên hatine piştgiriya xwe ji şoreşa jinê re nîşandan e û got, "şandeyên jinên biyanî bi şoreş û asta pêşketina jinê li Rojava û bakurê Sûriyê gelek bandor bûn. Lewra soza piştgiriyê di her alî dan. *Ronahî/ Qamişlo*

## Bexçeyê zarokan tê amadekirin

Meclîsa Jinên Tebqayê dest bi avakirina bexçeyê zarokan kir. Ev proje yê duyemîne ku li ser asta bajar tên destpê kirin.
Bexçeyê zarokan li taxa Yekem a Tebqayê ye. Bexçeyê zarokan ji 3 beşan pêk tê. Ekîbên kar dest bi xebatên sererastkirinê kirine. Bexçe di hundir de jî hate sererastkirin û hate amadekirin.
Piştî karê sererastkirinê bi dawî bibe wê odeyên bexçeyê zarokan were boyax kirin û li gorî zarokan wêne li ser dîwaran werin xêzkirin.
Armanca vê projeyê mîna projeyên din ku aboriya jinê were avakirin û xweseriya xwe di aliyê aborî de pêş bixe. Her wiha da ku bibe cihê alîkariya jinên dayîk ên ku di nava saziyên Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a herêma Tebqayê de dixebitin.
Ji aliyê xwe ve Dîwana Meclîsa Jinê dest bi qeydkirina navan kir da ku jinên di bexçeyê zarokan de bixebitin, diyar bikin.
Wek ku hatiye payîn wê kar û xebatên sererastkirinê di dawiya meha Remezanê de biqede…*ANHA*





## Kurd çarenûsa xwe dinivîsin

Tayip TEMEL

Merhaba xwendevanên hêja. Pêşeroja me roniye û bi vê mabestê bila Ronahî li me hemûyan pîroz be. Ji îro pê de emê bi hev re bin. Di vê pêvajoya dîrokî de, emê fikr û ramanê xwe parve bikin. Bê gûman wê meşeya me ya azadiyê bi serkeve.

Gelê kurd li her qadên Rojhilata Navîn, li her parçeyek Kurdistanê li ser piya û di nav berxwedanek dîrokî deye. Dem û dewran ya kurdan e. Êrişên li hemberê Kurdan mezin û berfireh in, taluke zêde ne lê belê neyarên gelê kurd çi dikin bila bikin, nikarin vê meşa azadiyê rawestîn in. Gelê me li her derê bi rêxistin, bi hêzin, xwediyê birdoziyek xurt, jiyanek alternatîf in. Bê gûman baweriya me ya serkeftinê ji her demê mezintir e.

Çawa ku kurd dinamîka guherînê û jiyana nû ne, dewlet û pergalê heremên jî di ber vê bayê guherînê de ne. Sedemek van êrişan yên li hemberê kurdan jî ev e. Tirkiye jî yek ji van pergala ne û ew jî dixwaze bi êrişkariya li hemberê kurdan vê gûherînê bide sekinandin. Lê derket holê ku ev yek ne pêkan e. Bi dehan car hat dîtin ku zûlmkar dawiya dawî de bi zilma xwe têk diçin. Ev dewlet û hêzin ku îro êrişê gelê kurd dike, tengijîne, li ber sekaret û têkçûnê ne.

Ji ber vê yekê tifaqa AKP û MHP'ê ku li ser dijberiya kurd hatiye avakirin, neçar man ku hilbijartina hildin pêş. Ev hilbijartin ji bo wan meseleya man û nemanê ye. Xwestin ku hin Tirkiye têk neçûye, xwe xilas bikin. Lê êdî tu tişt nikare wan ji vê têkçûnê xilas bike. Têkçûna wan dê bi destê gelê kurd be. Gelê kurd di vê hilbijartinê de xwediyê rolekî dîrokiye. Helwesta gelê kurd di vê hilbijartinê de diyarkar e.

HDP jî di vê warê de him li têkoşîna gelê kurd xwedî derdikeve û him jî bi vê têkoşînê mezin dibe. Parastina maf û azadiyên kurdan sedema hebûna HDP'ê ye. Cûdahiya HDP'ê ji partiyên pergalê jî dînamîka kurd e. Ji ber vê yekê ev 4 salen dawî ne, HDP di bin êrişan de ye. Dixwazin ku HDP'ê ji kurdan dûr bixin, diwarên di navbera HDP û kurdan de bilind bikin. Dixwazin bi van êrişan rastî û realiteya HDP'ê biguhirîn in. Lê bi ser neketin û nakevîn jî. Niha jî qaşo HDP û gelê Kurd tûne dihesibinin. Wekî ku bi milyonan kurd û HDP'î li vê welatê tûnene tevdigerin. Ji aliyê din ve jî li qadên hilbijartinê soza 'tunekirina HDP û Kurdan' didin dengdaran. Ev rewşekî şizofrenîk e. Tifaqa şerxwaz riya xwe wendakiriye, nizane ka dê çê bike. Dest û piyên wan li hev geriyaye. Lewma bi sozdayina OHAL'ê derdikevin pêşberê gel, soza pêkutiyê didin gel! Le ew çiqas êriş bikin kurd û HDP ewqas bi hêz dibin.

Di hilbijartina 24'ê Hezîranê de hemû stratejiya xwe li ser astengkirina HDP'ê û kurdan avakirine. Dizanin ku HDP bi ser bikeve dê ew têk biçin. Gelê kurd vê rastiyê dizane û vê hilbijartinê ji bo hesab pirsîna hemû polîtikayên AKP'ê dibîne. Lewma li gel hemû tifaqên qirêj, dek û dolaban gelê kurd dê qedera van hilbijartinan diyar bikin. Gelê kurd bi diyarkirina qedera Tirkiyeyê dê qedera xwe jî diyar bike. Qedera gelan bi hev ve girêdayî ye. HDP navnîşana vê dengeya azadiya di navbera gelan ava dike. Meşa me ya azadiyê, serkeftina HDP'ê û gelê kurd ji niha ve pîroz be. Ji niha ve gelê kurd bi serketiye û 25'ê Haziranê jî dê bi serkeftina HDP'ê bibe cejna gelan.

# Divê malbatên girtiyan baş bixebitin

***Komîteya Zindanan a PKK'ê li ser hilbijartinên 24'ê Hezîranê daxuyaniyek da destnîşan kir ku hilbijartinên 24'ê Hezîranê wê bibin hilweşîna fermî ya bloka faşîst a AKP-MHP'ê. Komîteyê wiha got, "Malbatên zêdeyî 10 hezar girtiyên siyasî, li dijî vê desthilatdariya faşîst a ku zarokên wan bi rengekî neheq xistiye zindanê, zext û êşkenceyê li wan dikin, divê li şûna zarokên xwe jî bixebitin."***

Komîteya Zindanan a PKK'ê li ser hilbijartinên 24'ê Hezîranê daxuyaniyek da û di serî de malbatên girtiyan bang li tevahiya civakê kir ku hesabên AKP-MHP'ê ji hev bixin.

Komîteya Zindanan a PKK'ê destnîşan kir ku hilbijartinên 24'ê Hezîranê wê bibin hilweşîna fermî ya bloka faşîst a AKP-MHP'ê û ji bo dengdanê bang li hemû malbatên girtiyan kir. Di daxuyaniyê de hate gotin, "Weke malbatên girtiyan divê em vê planê ji hev bixin û tifaqa faşîst a AKP-MHP'ê biqedînin."



Komîteyê diyar kir, bloka faşîst a AKP-MHP'ê ji bo pêşî li têkçûna xwe bigire û desthilatdariya xwe biparêze, hilbijartin ferz kiriye û wiha dewam kir:

"Lê belê xuya ye ev hilbijartin wê bibe îlana hilweşîna wan. Hemû şan û nîşaneyên li Tirkiyê radixin pêş çavan ku bloka faşîst a AKP-MHP'ê bi bayê bezê qels dibe û hildiweşe. Hêza vê bloka faşîst nemaye ku karibe welêt bi rê ve bibe. Hemû polîtîkayên îmha, zilm û zordariya ku bi navê 'Plana Têkbirinê' ji sala 2015'an û vir ve dimeşîne, ji aliyê gelê Kurd, gelên Tirkiyê û hêzên demokrasiyê ve bi berxwedanê hatine pûçkirin. Zelal û li pêş çavan e ku ya niha hildiweşe tifaqa faşîst a AKP-MHP'ê ye."

### 24' HEZÎRANÊ DIBE KU AKP-MHP'Ê BIQEDÎNE

Hilbijartinên 24'ê Hezîranê ji ber vê yekê girîng in. Ev hilbijartin dikare tifaqa faşîst a AKP-MHP'ê biqedîne. Lê belê ev yek wê xweber nebe. Ji bo vê, divê hemû hêzên li dijî desthilatdariya faşîst a AKP-MHP'ê ne, bi rengekî xurt, berfireh û rêxistinbûyî têbikoşin û bixebitin. Eger hilbijartineke normal bê kirin, şensê serketinê yê tifaqa faşîst a AKP-MHP'ê qet nîne. Lewma ji bo serketinê tenê rêyek li ber wan heye. Ew jî dizî û hîleyên hilbijartinê ye. Sicîl û meherta Erdogan a di vî warî de tê zanîn. Lewma karê herî girîng ê divê were kirin, rêxistinbûna li dijî hîleyan û xwedîderketina li sindoqan e.

Di vê hilbijartinê de, yekane xeta ku pirsgirêkên gelên Tirkiyê bi taybetî pirsgirêkên jin, ciwan, kedkar, gel û baweriyên cuda yên alîgirê edalet, demokrasî û azadiyê çareser bike, xeta HDP'ê ye. Girîng e her kes bi rengekî çalak li cem HDP'ê cih bigirin, ji bo serketina wê bixebitin, bi ruhê seferberiyê bi şev û roj kar bikin û bi ser bikevin. Ev yek wê bibe bersiva herî xurt ku ji tifaqa faşîst a AKP-MHP'ê re bê dayin.

Hêzeke din a pêşengê vê hilbijartinê jî malbatên girtiyan e. Malbatên zêdeyî 10 hezar girtiyên siyasî, li dijî vê desthilatdariya faşîst a ku zarokên wan bi rengekî neheq xistiye zindanê, zext û êşkenceyê li wan dikin, divê li şûna zarokên xwe jî bixebitin.

### XWEDÎ LI DEMÎRTAŞ DERKEVIN

Ji bilî vê yekê, namzetê HDP'ê yê Serokkomariyê Birêz Selaheddîn Demîrtaş jî girtî ye. Pêwîste hemû malbatên girtiyan di asta herî bilind de xwedî li birêz Demîrtaş derkevin.

Lewma her malbateke girtiyan berpirsyar e ku Rêberê me, girtiyên HDP'yî û zarokên xwe yên li zindanê temsîl bike. Çi li gundan, çi jî li taxan, her malbateke me ya girtiyan divê mîna buroyeke hilbijartinê ya HDP'ê, mîna komîsyona hilbijartinê bi hemû hêza xwe bixebite û bi baweriya serketinê seferber bibe. Li ser vê bingehê em serketinê ji hemû hêzên demokrasiyê, gelên xwe û malbatên xwe re dixwazin."

# Ocalan: Wan xera kir emê ava bikin



Namzetê parlamenteriyê yê HDP'ê Omer Ocalan, bertek nîşanî polîtîkayên hikûmetê da û wiha got: "Dibêjin HDP perçekirinê dike. Lê em dibêjin yên esil perçe dikin ew in. Wan perçe kir em wek HDP em ê ava bikin û bikin yek.

Namzetê parlamenteriyê yê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) yê Rihayê û Biraziyê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Omer Ocalan, derbarê polîtîkayên HDP'ê axivî. Ocalan ku 2 salan serokê HDP'ê yê Mêrdîn bû, niha mamzetê HDP'ê yê Rihayê ye.

### HDP NAVNÎŞANA ÇARESERIYÊ YE

Ocalan, bal kişand ser pirsgirêkên Tirkiye û rêbazên çareseriyê û da zanîn ku tenê rêya çareseriyê HDP ye. Ocalan, anî ziman ku HDP navnîşana reng û baweriyan, demokrasî, azadî, aştî û edalete ye. "Her kes xwedî yek fikir e ku hikûmeta AKP'ê tu tişt ji gel re neanî. Her kes bawer dike ku civak perçe kir. Niha Tirkiye li ser kendal e. Bajarên hatin xerakirin û talankirin hene. Ev polităka pirsgirêka kurd çareser nake. Ji bo em rol û misyona xwe bilîzin me biryar stend ku di nava HDP'ê de cih bigirin. Pirsgirêkên welat ên kûr hene. Pirsgirêka kurd, pirsgirêka aborî û pirsgirêka siyasî heye. Ji bo ev pirsgirêk çareser bibin em dixwazin siyaseta demokratîk pêş bikeve."

### DIVÊ EM AŞTIYÊ FERZ BIKIN

Ocalan bal kişand ser îtîfaqa Cumhur a di navbera AKP, MHP û BBP'ê de û wiha got: "Ev îtîfaq nîşan dide ku HDP çiqas xurt bûye. Lê divê em bêtir xurt bibin. Ji ber ku pirsgirêkên Tirkiye pir mezin in û divê em wan çareser bikin. Divê em aştiyê li ser her kesî ferz bikin. Tu girêdana me û nêzîkbûna me bi îtîfaqên millet û cumhur re tune ye. Li Tirkiye HDP ji aliyê partiyên din ve wekî dijmin hat dîtin. HDP dê di çareseriya pirsgirêkên siyasî û civakî de rolek mezin bide ser xwe. Niha HDP'ê wekî partiya cudakar dibînin. Lê em dibêjin yên Tirkiye perçe dikin ew bi xwe ne. Ew perçe û xera dikin. HDP jî komî ser hev dike û ava dike."…*MA*

# Derwêş: Em ji Minbicê venakişin

Berdevkê Fermî yê Meclîsa Leşkerî ya Minbicê Şervan Derwîş vekişandina Meclîsa Leşkerî ya Minbicê ji bajarê Minbicê derewand û tekez kir ku gelek alî dixwazin ewlehî û aramiya herêmê tevlî hev bikin, lewma agahiyên berovajî belav dikin.

Berdevkê Fermî yê Meclîsa Leşkerî yê Minbicê Şervan Derwîş diyar kir ku gelek dezgehên çapemeniyê dibêjin Meclîsa Leşkerî ya Minbicê xwe ji bajarê Minbicê vekişandine da ku artêşa Tirk a dagirker derbasî wê bibin.

Derwêş da zanîn ku Meclîsa Leşkerî ya Minbicê û Hêzên Koalîsyonê di nava hevkariyê de ne û destnîşan kir ku gotinên hatin belavkirin derbarê vekşandina Meclîsa Leşkerî ji bajêr derewin. Gelek alî hene dixwazin aramî û ewlehiya li herêm tevlî hev bikin. ji ber wê agahiyên wiha belav dikin."



Derwêş diyar kir ku heta niha koalîsyon û Tirkiye derbarê çarenûsa Minbicê de ne gihiştine tu itîfaqan.

Berdevkê Fermî yê Meclîsa Leşkerî yê Minbicê Şervan Derwêş destnîşan kir ku şandeyek ji Wezareta Karê Derve ya Amarîka serdana Meclîsa Leşkerî ya Minbicê kir û tekez kirin ku ew ê piştgiriya Meclîsa Leşkerî ya Minbicê bikin…*ANHA*

# Demîrtaş: Divê em dengê xwe biparêzin

Namzetê HDP'ê yê serokkomariyê Selaheddîn Demîrtaş diyar ku rola HDP'ê a di hilbijartinan de roleke krîtîk û sereke ye û bal kişand li ser girîngiya parastina dengan.

Namzetê HDP'ê yê serokkomariyê Selahddîn Demîrtaş ji rojnameya The Natîonal re axivî ya ku li Emîrtiya Ereban a Yekgirtî bi Îngilîzî weşanê dike. Demîrtaş bi rêya parêzeran bersiv da pirsên rojnameyê.

'Demîrtaş got ku, "Di vî halî de kî bi ser bikeve, gelo ew ê karibe bi dilekî fireh li ser wê paldankê rûne? Hê ev pêşbazî didome, ez di girtîgehê de me. Ji ber vê jî kî were hilbijartin ew ê meşrûiyeta wî/ê qels be."

Demîrtaş diyar kir ku ew kampanyaya hilbijartinê bi rê ve nabe, tenê kampanyaya li derve dixwaze motîve bike.

Demîrtaş bal kişand ser vî tiştî ku HDP 'aktorekî sereke ye' û got "Siyaset ne bi tenê ji bo Kurdan, ji bo kesên ne li ser fikra AKP'ê ne jî, hatiye tengkirin."

Demîrtaş diyar kir ku heke ew were hilbijartin ew ê rayeyan belav bike û got, "Li ser wê paldankê ya ku gelek rayeyê min ew ê hebe, piştî bidawîbûna peywira min, ez ê rahêlim çakêtê xwe û ez ê herim."

Demîrtaş li dijî hîleyên AKP-MHP'ê hişyarî da û wiha got; "Di hilbijartinan de li dijî binpêkirin û karê ne li rê divê em dengê xwe biparêzin."

Di nûçeya rojnameyê de wiha tê gotin; "Li gorî gelek çavdêran piştî hilbijartinan Erdogan ku serokkomariyê qezenç bike lê li meclîsê zêdeyî bi dest nexe, wê carek din banga hilbijartinê bike bi guman in", Demîrtaş wiha got; "Di aliyê aborî, siyasî û civakî de ev welat ne di rewşa hilbijartineke din de ye."



# Hovîtîya Tirk sînoran nas nake

***Dewleta Tirk ya dagirker û çeteyên wê piştî ku Efrîn dagirkirin dest bi her awayî kirinên der mirovî û hovîtiyê kirin. Sivîlê Efrînî Xelîl Mihemed ku 67 rojan di destê artêşa Tirk de ma behsa hovîtiya wan kir.***



Bi sedan EFrînî li girtîgehên Raiyê yên Ezazê têne girtin û êşkenceyên derveyî mirovane li wan tê kirin. Xelîl Mihmed ê sivîl ê Efrînî hovîtiya dewleta Tirk û çeteyên wan vegot.

Dewleta Tirk û çeteyên wan li Efrînê malê gelê Efrînê talan kirin, bi sedan sivîl êşkence kirin û bi sedan jî gritin. Bi sedan sivîlên Efrînî yên ku hê jî hêsîr in, hê jî li girtîgehên Efrîn, Ezaz û Hatayê disekinin. Bi dehan jê agahî ji wan tine.

### HER ROJ ÊŞKENCE LI ME KIRIN

Xelîl Mihemed jî piştî êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wan li ser gundê xwe ma. Dema ku dewleta Tirk û çeteyên wan gundê Balya yên Bilbilê dagir dikin, wî hêsîr digirin. Xelîl Mimehed 16 rojan hêsîr hate girtin. Mihemed dibine girtîgeha Raîyê ya li Ezazê. Mihemed got bi sedan kes li Raîyê têne girtin û her roj êşkenceyê li wan dikin.

### ÊŞKENCE LI ZAROKÊN 12-13 SALÎ DIKIN

Mihemed dibêje ew li ser gundê xwe maye, ji ber ku ixtiyar e û ji piyekî xwe kulek e û dibêje, dema ku dewlet Tirk û çeteyên wan hatine êşkence lê kirine, lêxistine û 16 rojan ew li girtîgehê hiştine, piştre ew birine girtîgeha mezin a li Ezazê, li wir êşkence lê kirine û wiha dewam kir: ''Li rûyê min dixistin, dev û diranên min şikandin, niha guhê min giran in. Ez nabihîsim. 200 qamçî li min dan. Ya min dîsa xem nake, zarokên 12-13 salî êşkence li wan jî kirin, elektrîk dane wan. Dîsa yên li xeribiyê (ji bo koçerên Efrînê tê gotin) tim êşkencê li wan dikin. Ev ne Kurd in jî, zilmê li wan dikin. Ava kelandî bi wan de dikin. Lê min bi çavê xwe dit, tiliyên du destan ên zarokekî venedibûn, şewitîbûn.''

### PÎSIYÊ DAVÊJIN SER MIROVÊN KAL

Mihemed diyar kir ku hin mirovên 80 salî hene, êşkence li wan dikin, pîsiya însanan davêjin ser wan, zarok hene, sivîl hene û tim êşkence li wan dikin.

Mihemed dibêje rojê tenê nanek didane 4 kesan, derfetên xweşuştinê nebûye, çixare nedida wan û her cure êşkenceya ku mirov bîra wê nebe bi wan dikirin.

Xelîl Mihemed ku 67 rojan li girtîhehê dimîne tê berdan. Mihemed dibêje li girtîgehê hemû biryar ji hêla dewleta Tirk û çeteyên wê ve têne dayin, ti mafê gotinê yê çeteyên girêdayî TIrk nîn e.

### EM LI ARAZIYEKE BI MAYIN DANÎN

Mihemed dibêje piştî 67 rojan ew berdane, 31 kes kirine girtîgehê, qemyon hecicandine, û ew li araziyekê danîne.

Mihemed wiha dewam kir, "Em nedan OSO. Ji mere gotin, 'ji araziyê biçin, bila OSO we nekuje''. Çima OSO me bikuje? Em ji girtîgehê hatine û qeydên me hene. Lê armanca wan cuda bû. Dixwestin ku me bidin kuştin. OSO rêya me birî, li ser me geriyan. Me got, 'em ji girtîgehê tên. Li ser me tiştek nebû.'' Li me hemûyan sar bû OSO jî gote me ji araziye biçin. Armanca wan ew bû ku mayin bi me de biteqin.''

Mihemed dibêje li wir hemû biryar û her tişt di dest dewleta Tirk de ye. Tiştek di dest OSO de tine, tenê wergera Erebî û Kurdî ji wan re dikin. Mihemed her wiha dibêje heke wê êşkence li hinan were kirin dewleta Tirk biryara vê dide û dibêje, ''biçin her tiştî bi wan bikin'' û ew jî dkin.

Xelîl Mihemed herî dawî dibêje, ''Zilma li wir nayê gotin. Ew ne misilman in.

Li Efrînê 5 ji 100'î Kurd in. Piranî çete ne. Hemû diz in. Hemû titşên gel dizîn. Malên gel talan kirin, kargehên wan talan kirin, Wesayitên wan, hemû tiştên wan birin. Min bi çavê serê xwe dît. Li Efînê ez li cem malbateke Kurd mam. Wan alîkarî da min. Piştre ez 14 rojan meşiyam, giham Til Rifatê.''…*ANF*


# Nameyek ji Zanyar Muradî û Ramîn Hisên

Zanyar Muradî û Ramîn Hisên Penahî ku cezayê darvekirinê li wan hatiye birîn bang li raya giştî kirin: "Em hêvîdarin ku çalakiyên parêzvanan bibine bingehê hişyarbûna raya giştî ya Îran û Kurdistanê li hemberî darvekirina siyasetmedarên li Kurdistanê."

Şevê din girtiyên siyasî yên Kurd Zanyar Muradî û Ramîn Hisên Penahî nameyek hevbeş a vekirî li girtîgeha Recahî Şarî ya bajarê Kerec û girtîgeha navendî ya bajarê Sine, ji bo raya giştî belav kirin.

Herdu girtiyên siyasî Zanyar Murad û Ramîn Hisên Penahî di peyama xwe de wiha ragihandin; "Tinekirina fîzîkî û darvekirina mirovan yek ji şêwazên herî kevin ên cezakirinê ku ji serdema kevin tê. Hikûmetên navendî yên dîroka Îranê ji destpêka şoreşa rewabûna Îranê (îhtimal hebû ku encama sîstemek demokratîk derkeve), darvekirin weke amêrek ji bo tinekirina kesayetên nerazî bikar tîne. Heya van demên dawiyê jî darvekirina Kurdek ji bo gelê Îranê bûyerek ne rewa nebûye. Ji ber ku Kurd timî ji aliyê dezgehên propagandayê yên hikûmeta Îranê ve, Kurd weke kesên serbûxwe û tundutûjî xwaz tên nîşandan.





Em weke du girtiyên siyasî yên cezayê darvekirinê xwarine, ne ku tenê li coxrafyek bi navê Kurdistanê, weke girtiyên siyasî ji bo Îraneke demokratîk têdikoşin. Em bang li parêzvanên mafê mirov dikin, li ser vî cezayê ne mirovane lêkolîn bikin, ji bo hikûmet nekare bi pişt dayîna dezgahên propagandaya xwe vê siyasetê berdewam bike."

Di dawiya peyamê de wiha jî hate gotin; "Hêvî dikin ku çalakiyên parêzvanan bibine bingehê hişyarbûna raya giştî ya Îran û Kurdistanê li hemberî darvekirina siyasetmedarên li Kurdistanê. Hêvî dikin di demek nêzîk de li Îranê dewletek giringî bide azadî û demokrasiyê ava bibe, mafên gelên Îranê biparêze."

Girtiyê siyasî yê Kurd Zanyar Muradî ji bajarê Merîwan ê Rojhilatê Kurdistanê ye. Di sala 2009'ê de hatiye girtin û sala 2011'ê cezayê darvekirinê lê hatiye birîn. Zanyar niha li Girtîgeha Recayî ya bajarê Kerec tê ragirtin.

Girtiyê siyasî yê Kurd Ramîn Hisên Penahî jî cezayê darvekirinê lê hatiye birîn. Ramîn havîna par li bi birîndarî kete destê hêzên rejîma Îranê û bi mehan li Girtîgeha Îtlaatê hate êşkencekirin. Piştre şandin dadgehê û cezayê darvekirinê lê hate birîn.

# Daran hildikin, bargehên leşkerî çêdikin



Artêşa Tirk a dagirker li Efrînê erdên ku milkiyeta wê ya sê welatiyan bû û 500 darên zeytûnan tê de hebû kirin bargeha leşkerî. Dema welatiyan serlêdan kirin da ku rê nedin bargeh were çêkirin fermandarên Tirk ji wan re gotin: "Me êrîşî Efrîn kir û dagir kir. Ma niha dibe ku em destûrê ji we bixwazin." Li aliyê din Artêşa Tirk li gundê Bilîlko ya herêma Raco dar rakirin û rawestgeha helîkopteran çêkirin.

Çavkaniyê bi navê M.S yê ji gundê Eltane ya herêma Raco ji Ajansa Hawarê re ragîhand ku Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê ji beriya hefteyekê ve 500 darên zeytûnan li rojhilatê gundê Eltaniya ji kok ve hilkirin. Li cihê wê jî bargeha leşkerî ya fireh çêkirin."

Heman çavkanî da zanîn ku erdê dar jê hatin hilkirin yên welatiyên bi navê Mihemed Elî Qero yê ji gundê Hecî Cemal a herêma Raco, Mihyedîn Beladîo û Ehmed Salih ên ji gundê Eltaniye ne.

Çavkanî da zanîn ku dema Mihemed Elî serî li wan da dagirkeriya Tirk berdanê û dema li bajaêr Efrînê gilî kir jê re gotin: "Me êrîşî Efrînê kiriye, me herêm dagirkiriye. Ma dibe ku dema em erdên we bibin û daran rakin, destûrê ji we bixwaz in."Li aliyê din çavkaniyan ji Efrînê ragîhandin ku Artêşa Tirk a dagirker hewl dan mala welatiyê bi navê Hesen Reşîd Bîlal ê ji gundê Hecî Xelîl ji xwe re bikin bargeh ji bo çavdêriya herêmê bikin, her wiha li rojhilatî herêma Raco li Çiyayê Mîra jî noqteyeke din çêkirin.

### RAWESTGEHEK HILÎKOPTERAN ÇÊKIRIN

Çavkaniyan her wiha destnîşan kirin ku li gundê Belîlko ya herêma Raco rawestgehek ji bo helîkopteran di nava darên zeytûnan de çêkirin. di cihê çêkirina rawestgehê de bi dehan dar hilkirin.

# Ji bo HDP'ê têk bibin seferber bûne

Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî di çarçoveya xebatên hilbijartinê de li bajarê Tirkiyê Enqerê bi gel re civiya. Temellî bal kişand ku Desteya Bilind ya Hilbijartinê YSK jî di nav de hemû saziyên cemawerî ji bo HDP'ê têk bibin ketine nava seferberiyekê.

Xebatên hilbijartinê yên Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) yên 24'ê Hezîranê dewam dike. Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî li Enqerê bi gel re civiya. Temellî diyar kir ku HDP a dengê heqîqetê ye bi domdarî dengê xwe li her derê bilind dike û got: "Em bi hev re bi berxwedana rûmetê ya gelê Kurd, kedkarên Tirkiyê, bi têkoşîna yên li dijî şer, bi hev re benda li pêşiya aştiyê bûye asteng hilweşînin." Temellî bibîr xist ku namzetê serokkomariyê yê HDP'ê Demîrtaş bi awayekî bê hiqûqî tê ragirtin.

Temellî bal kişand ser berdana Demîrtaş û got: "Em li vir carekî din bang li YSK'yê dikin, li gorî rêziknameya xwe tevbigerin û bi lezgîn Demîrtaş berdin. Demîrtaş namzetê Tirkiyê ye. Namzetên HDP'ê jî namzetên Tirkiyê ne. HDP partiya Tirkiyê ye. Ji bo hilweşandina vê bendê û pêşiya demokrasiyê li Tirkyê bê vekirin em 24 saetan kar dikin.

Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî bibîr xist ku hilbijartina 24'ê Hezîranê fersendeke û diyar kir ku YSK jî di nav de hemû saziyên cemawerî ji bo HDP'ê bixin bûne seferber. Temellî ji bo xwedîderketina li sindoq û dengan bang li erkdarên sindoq û muşahîdan kir û got: "Ji bo bûna erkdarên sindoqan, ji bo bûna muşahîd herî dawî 2 roj mane. Divê em van du rojan baş binirxiînin. Ji bo dengên me ne dizin. Divê her kes xwedî li dengê xwe derkeve. Em ê li gel hemû namzetên xwe, hemû teşkîlata xwe, pêkhate û saziyên li gel îtifaq pêk anî û gelê xwe, 24'ê Hezîranê benda hilbijartinê hilweşînin."



# Pirtûka Sakîne Cansiz hate nasandin

Îngilîziya pirtûka Sakîne Cansiz a bi navê "Jiyana min timî şer bû" (Sara My Whole Life Was a Struggle), roja 29'ê Gulanê li paytexta Îngilîstan Londonê bi civînekê hate nasandin.

Civîna danasînê ji aliyê YXK û Roj Women ve hate organîzekirin û wergêra pirtûkê Janet Bill, rojnamevan Ulkem Zeremya û nûnera weşanxaneya Pluto Press ku pirtûk çap kir, tevlî civînê bûn. Janet Bill qala agahiyên kronolojîk ên di bergê destpêkê yê pirtûka "Jiyana min timî şer bû" kir û got, Sakîne Cansiz jineke berxwedêr bû.

Rojnamevan Ulkem Zeremya jî diyar kir ku pirtûk hem biyografiyeke şexsî ye, hem jî dîroka Tevgera Azadiyê ya Kurd e. Zeremya Cansiz şiband çemekî timî diherike û got, ew rêbereke dîroka jinê bû. Zeremya işaret bi berxwedana Cansiz a li hemberî cûntakarên 12'ê Îlonê kir û destnîşan kir ku di bingeha têkoşîna Cansiz de edalet, jiyaneke wekhev, maf û azadî heye.

Di dema civînê de li standa Pluto Pressê pirtûk hate firotin û wergêr Janet Bill jî îmze kir.

